Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 54
31'ê December
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Cejn û Sersala We Ya Nû Pîroz Be

Bi boneya cejna pîroz ya Qurbanê, em pîrozbahiyên xwe ên herî germ pêşkêşî hemû Misilmanên cîhanê û Kurdistanê dikin. Herwiha sersala nû ya Zayînî(2007)'an ji hemû gelên cîhanê re pîroz dikin. Em hêvîdar in ku sala nû ya Zayînî bibe sala aştî, tebayî, azadî, wekhevî û cihgirbûna demokrasiyê di cîhanê de... **Desteya Weşanê ya Agirî**

# Sedam Husên Hat Îdamkirin

Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Biryarnameya ...




2

Axavtina Rêzdar Hesen Şerefî, Cihgirê Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Di Rê Û Resma 26'ê Sermawezê...



3

Cejna Du Cejn...



5

Jin Û Bizava Neteweyî Ya Kurd...



7

"Şeva Herî Dirêj"…



9

Çanda Xwendin Û Nivîsandinê…



10

**- Buş pêşwaziya îdamkirina Sedam kir**
**- Di sala 1988'an de Sedam Husên dest bi operasyona Enfal kir û bi hezaran Kurd qir kirin...**
**- Di dema îdamkirinê de Sedam nexwestiye tûr bixin serê wî**
**- Îsraîl û Îran: Îdamkirina Sedam serkeftina edaletê ye**
**- Lîbya 3 rojan şînê girê dide**





Serok Wezîrê Îraqê, Nûrî El Malikî di daxuyaniyeke taybetî de ragihand ku roja Şemî 30.12.2006'an Serokê Îraqê yê rûxandî, Sedam Husên bi sûçê kuştina 148 Şîîyan li Duceylê di salên 80'an de hate îdamkirin.

El Malikî bang li piştgirên Sedam kir û got: Werin tevlî xebata siyasî bibin û dev ji terorîzmê berdin.

Hate ragihandin ku daleqandina Sedam Husên li derveyî Navçeya El Xadra çê bûye.

Musteşarê Ewlekariya netewî ya Îraqê, Muwefeq El Rubeyî jî got: Sedam Husên di dema daleqandinê de li berxwe nedaye.

Li gora çavkaniyeke din, dê birayê Sedam **Barzan El Tekrîtî** û **Ewad Bender** jî dê piştî cejna Qurbanê werin darvekirin.

Herwiha hat ragihandin ku termê Sedam Husên bi firokeyek Amerîkî birine Tekrîtê û li wir teslîmî eşîra wî kirine. Hêjayî gotinê ye ku termê Sedam li bajarokê Oce li nêzîk Tekrîtê hatiye veşartin.

## Mehkûmbûna Îranê Ji Aliyê Dadgeha Federal Ya Amerîka

Dadgereke Dadgeha Federal ya Amerîka, Rays Lambêrt, dewleta Îranê di êrîşa li ser binkeya hêzên Amerîkî li Erebistanê ku têde 19 kes hatin kuştin, tawanbar kir.



Dadger Rays di hukmê xwe de daye zanîn ku Îranê di teqîna sala 1996'an ya li bajarê Zehran a Erebistana Seûdî de dest hebûye, lewra divêt 254 milyon dolaran weke ceza ji malbatên goriyên bûyerê re bide. Navhatî hukmê xwe li gor belgeyên polîsê Federal yê Amerîkayê(FBI) daye.

FBI li ser vê bawerê ye ku rêxistina Ewlekarî ya Îranê û rayedarên payebilind yên Komara Îslamî bernameya êrîşa ku têde 19 kes hatin kuştin, darêtine û bo vê kiryarê ji girûpa Hizbula a Erebistanê mifah standine.

Di hukmê dadger de îşare hatiye kirin ku Îran ji kiryarên terorîstî piştevaniya malî û leşkerî dike û ji bo encamderên wê, nasname û belgeyên qelp û ceilî amade dike.

Hêjayî gotinê ye ku Lambert 3 salan berî niha jî li hukmeke din de Îran bi berpirsiyarê êrîşek wekhev di sala 1983'an li Lubnanê de zanî ku bû sebeba mirina 241 leşkerên deryayî.

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Biryarnameya Konseya Ewlekariyê Li Dijî Komara Îslamî Ya Îranê

Welatiyên rêzdar!
Azadîxwazên Îranê!
Civatên xebatkar yên xelkê Kurdistanê!

Piştî çend mehan bas û nîqaş, gelaleya sepandina cezayan bi ser Komara Îslamî ya Îranê de ku ji aliyê welatên Îngilîstan, Fransa û bi hevkariya Almaniya hatibû amadekirin, bi sedema hinek têdîtinên Çîn û Rûsiyayê çend caran guhertin bi ser de hat, aqibet roja şemî, 23.12.2006'an, ji aliyê endamên Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve bi dengdaneke giştî hate pejirandin.

Ev biryarname li pey ew hemû hewl û xebatan hat dayîn ku civaka cîhanî ji bo destberdana Komara Îslamî ji zengînkirina Uraniyûmê ji xwe nîşan da, lê ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve hatin bêencamkirin û bersiva ret bi wan hate dayîn.

Biryara 1737'an ya Konseya Ewlekarî ya RNY şandina hemû cure alav û amûran ji bo Îranê ku têkilî bi biryarnameyên Etomî yên Îranê ve hebe, qedexe kiriye. Her wiha ev biryare hişyariyê bide rejîma Komara Îslamî ku heke heta du heyvên din meyandina Uraniyûmê nerawestîne, li gorî benda 47'an ya Destûra Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dê tevî dorpêçkirinên zêde û berfirehtir di warên aborî, peywendiyên dîplomatîk, veguhastin û hatin û çûnê berbirû bibe. Her li gorî vê biryarê ji bo kes û saziyên ku bi dûr ji zêrevaniya Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî (IAEA), di xebat û pirojeyên Etomî û mûşekçêkirinê yên Îranê de beşdariyê dikin, cezayê destbiserdegirtina heyîna wan hatiye dan.

Her çiqas biryarnameya Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî derheq cezakirina Komara Îslamî ya Îranê vê gavê pêka leckirin û serhişkiyên Komara Îslamî li hember civaka navneteweyî nerm û jar e, lê serbarê vî halî jî eger weke yekemîn gava dijkiryar li hember rejîmeke dîktator û serberdayî mîna Komara Îslamî were dîtin, girîngî û nirxa taybet bi xwe heye. Her eva ku endamên Konseya Ewlekariyê bi tevahiya dengan (her 15 dengan) biryara cezakirina Komara Îslamî dipejirînin, tê wê wateyê ku vê rejîmê naverok û cehwereke dîktatorane heye û pêbendê tu pesendkriyên navneteweyî nîn e û hewce ye bihê cezakirin, ew dengdana giştî ya Konseya Ewlekariyê jî di demekê de ye ku welatên Çîn û Rûsiayyê berjewendiyên zaf di Îranê de û têkiliyeke xurt tevî Komara Îslamî hene, serbarê vî halî jî dîktatorî û leckirinên vê rejîmê heta qasekê ye ku ew du welat û dewletên wekî wan, jî nikarin ji bilî sivikkirin û lawazkirina biryarên li terzê vê biryara Konseya Ewlekariyê çavê xwe ji esla pirsê û naveroka vê rejîmê bimiqînin.

Bi liberçavgirtina dijkiryara Komara Îslamî ya Îranê li hember vê biryara Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û bi girîng nehesibandin û bênirxkirina wê ji aliyê rejîmê û biîsrarbûn û tekezkirin li ser domandina dewlemendkirina Uraniyûmê, wisa tê xuyakirin ku civaka cîhanî bêtir bîne ser vê baweriyê ku ew rejîme bi hêsanî daxwaza saziyên navneteweyî berçav nagire û heke pêve micidtir nelivin, tevnegerin, gef û metirsiyên wê ji bo civaka navneteweyî dê zêdetir bibin, lêre de ye ku wisan tê xuyakirin Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî gaveke din jî li pey vê pêngavê de li dijî Komara Îslamî ya Îranê bavêje û encama wan dijkiryaran jî ne ron û diyar in, ku dê endamên wê Îranê bi tu rewşekê re berbirû dike, tenê eva nebe ku berpirsiyariya her rewşeke nexwetî dikeve ser milê Komara Îslamî ku bi domandina leckirin û fitne û têkdreriyên xwe, Îranê bi kirîzeke taybet re rû bi rû dike.

Bêguman hewildan û xebata Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî ji bo berlêgirtin li bidestxistina çekên Etomî ji hêla Komara Îslamî, girîng û pireseke hestiyar e, lê bicî û pêwîst e ev rêxsitine vê rastiyê jî li berçav bigire ku metirsiyên Komara Îslamî bo ser civaka Cîhanî û ewlekariya herêmê û neteweyên Îranê tenê li hewildana rejîmê ji bo bidestxistina çekên Etomî bertesk nabe. Ji ber ku beşeke mezin û berçav ya metirsiya terorîzmê ku niha civaka navneteweyî digel de berbirû maye, ji bo rejîma Komara Îslamî ya Îranê wekî rejîmeke terorîst û terorîstperwer vedigere. Rejîmek ku deste û girûpên terorîstî xurt û bihêz dike û ji wan re pêwîstî û îmkanatan pêk tîne û di vê derbarê de maytêkirinê di kar û barên hundirîn ên welatên herêmê wekî Lubnan, Îraq, Filistîn û gelek cihên din dê dike û li wan deran fitne û têkderiyê çê dike bona vê çend ku aştî û aramî û ewlehî di van welatan û di vê herêmê de cihgir nebe. Di der barê neteweyên Îranê de, rejîma Komara Îslamî, wekî rejîmeke paçverû, dijî mirov û binpêkerê maf û azadiyên gelên Îranê tevdigere û bi kiryar Îran yê kiriye girtîxaneyeke mezin ji bo gişt Îraniyan û di nava vê zîndana mezin de jî sedan û bigire hezaran girtiyên din yên çalak û xebatkarên siyasî û azadbîr û azadîxwazên welat û xortên ser bi neteweyên mafxwaz ên Îranê tejî kirine, lewra nefsa hebûna rejîmeke wiha bi xwe ji çeka Etomî zêdetir cihê tirs, xetere û gefê ye û nabe civaka cîhanî û nemaze Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî vê pirsa girîng berçav negire û li hemberî wê de xemsar yan sisthelwest be.

Xetera hebûna çeka Etomî di destê rejîma Komara Îslamî de jî rast ji bo kakil û naveroka vê rejîmê vedigere, nek bo hebûn û nebûna çekên cur bi cur û heta tevkuj.

Em serbarê vê çendê ku biryara 1737'an ya Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî li gorî leckirinên rejîma Komara Îslamî ya Îranê derheq civaka navneteweyî wekî cezayeke pir sivik û nepêwîst dizanin, lê serbarê vî halî jî piştgiriyê jê dikin. Em hêvîdar in ev gava Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî bibe destpêka gavên micidtir ên din ji bo kontrolkirin û çavdêriya milhurî û serberdayîbûna vê rejîmê.

Her wiha em li benda vê çendê ne ku Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, zext û givaşxistina bo ser Komara Îslamî ya Îranê tenê di çarçoveya doza çeka Etomî û xebat û çalakiyên gumanbar ên vê rejîmê de bertesk neke, belkî bi awayekî hêja û berfireh li pirsa mafên mirovan û maf û azadiyên neteweyên bindest û zulmlêkirî yên Îranê re binêre ku bi awayên herî tund ji aliyê Komara Îslamî ve tên binpêkirin.

Xortên gelên Îranê û yek ji wan neteweya Kurd li Kurdistana Îranê, mirovên aştîxwaz û azadîxwaz in ku ji bo maf û azadiyên xwe li dijî Komara Îsslamî ya Îranê û bo avakirin û anîne serkara sîstemeke demokratîk di Îraneke Federal de dixebitin. Alîkarîkirin bi neteweyên azadîxwaz ên Îranê ji bo hilweşandina rejîma Komara Îslamî û gihîştin bi armanc û xweziyên wan, hevkarîkirin bi cîgirbûna aştî û demokrasî di herêmê de û bi dûrketina civaka cîhanî ji gef û metirsiyên çekên Etomî, terorîzm û fitne û têkderiyên Komara Îslamî ya Îranê ye.

**Partiya Demokrat Ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**26.12.2006**
**05.10.1385**

Rêzdar Hesen Şerefî, Cihgirê Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Di Rê Û Resma 26’ê Sermawezê, Roja Pêşmergeyê Kurdistanê De:

# “PÊŞMERGE SEMBOLA XEBATA NETEWEYA KURD DE”

**Hevalên hêja!**
**Xûşk û birayên rêzdar!**

Îro 26’ê Sermawezê, Roja Pêşmergeyê Kurdistanê, roja bibîranîn û balkişandin bi ser xislet û taybetmendiyên Pêşmerge û roja rêzgirtin li fîdakarî û xwegorîkirina xortên têkoşer û xebatkar ên neteweya me ye. Bi vê hinceta pîroz ve, ez ji aliyê rêberiya PDK Îranê, pîrozbahiyê ji hemû Pêşmergeyên Kurdistanê bi giştî û nemaze Pêşmergeyên leheng û fîdakar yên partiya me dikim. Her wiha pîrozbahiyê ji civatên xebatkar yên Kurdistanê dikim ku evladên wan di refa Pêşmerge de ne û parêzer û perwerdekerê Pêşmergeyê Kurdistanê ne. Pêşmerge kê ye ku em rêz û hurmetê jê digirin û rojekê bi navê wî diyarî dikin?

Pêşmerge ji bo wan kesan ku li Kurdistanê dûr in an tevî nav û taybetmendiyên Pêşmerge û erkên wî nenas in, renge bi hêsanî wisan bifikirin ku tenê hêzeke çekdar e, wekî hemû ew çekdarên ku di refa hêzên çekdar ên welatan de cihgir bûne. Lê ma gelo Pêşmerge hêzeke çekdar yê bi vî awayî ye? Şirove û dahûrandineke biçûk bi hêsanî ji me re derdixe holê ku Pêşmerge çi hêzeke çekdar e û hilgirê çi bîr û baweriyekê ye û ji bo çi armancekê dixebite? Ew çekdarên ku di refa hêzên çekdar ên welatan, nemaze wan welatan de ku desthilatdareke dîktatorî bi ser wan de zal e, em dibînin ku parek ji wan hêzan bi neçarî hatine girtin û bi darê zorê di refa hêzên çekdar de hatine cihgîrkirin. Lê ma gelo Pêşmerge bi zorî û mecbûrî di vê ref û çeperê de cihgir bûye? Pêşmerge bi dilxwaza xwe û ji bo armancên xwe di vê sengerê de cihgir bûye. Heke ew hêzên ku min qala wan kir, ji ber vê çendê di refa hêzên çekdar ên welat û dewletan de weke kar, pîşe û xebitîn cihgir bûne, ji bo dabînbûna debara jiyana xwe ew kare kirine, rast berevajî vê yekê, Pêşmerge dest ji kar, jiyan û hemû îmkan û heyiniyên jiyanê di rêya azadî û bexteweriya gelê xwe de hilgirtiye, berdaye. Heke ew hêzên ku me qala wan kir, di welatên dîktator de, parêzerên desthilata dîktatoriyê ne, Pêşmerge rast berevajî vê çendê li hember wan hêzane de ye, li hemberî dîktatoriyê de ji bo bidestveanîna azadî û demokrasiyê xebatê dike. Eger di gelek welatan de, hêza çekdar ya leşkerî tenê karê wê xebata leşkerî ye û ji siyasetê dûr tên ragirtin, Pêşmerge xwe mirovek mirovhez yê siyasî ye, xwedî bîr û bawer e, azadîxwaz e. Lewra ye heke em bixwazin gelek bi kin û kurtî û di hevokekê de bibêjin, Pêşmerge kê ye: Em dikarin bibêjin Pêşmerge xortê neteweyeke bindest wekî neteweya Kurd e ku ji azadiyê bêpar, mafên wî hatine binpêkirin, dîktatorî bi ser de zal e, heta hewl û cehda helandina nasnameya neteweya wî tê dayîn. Ew xortê wî gelî ye û hest bi nebûna azadiyê, binpêkirina maf û tirsa helandin û ji holê rakirina nasnameya neteweya xwe dike, hest bi vê çendê jî dike ku divêt ji bo azadî û serbestî û ji holê rakirina wan hemû zulm û stem û metirsiyên li ser neteweya xwe xebatê bike, ne tenê bi kiryar xebatê dike, belkî di xebat û tekoşîna hemû xortên neteweya xwe de ku bi awayên cur bi cur dimeşînin, di ref û çepera herî pêş ya wê xebatê de ye. Ji ber vê çendê ye ku dibêjin: “Pêşmerge xorteke xwedî bîr û bawer yê Kurd e ku ji bo armancê dixebite û ji bo berxwedanîkirin ji neteweya xwe li tev şekl û metodên xebatê û yek ji wan xebata çekdarî mifahê distîne”.



Koma ciwanên Demokrat di dema xwendina sirûda netewî ya Ey Reqîb di Roja Pêşmergey Kurdistanê de

Bê sebeb nîn e ku nav û peyva Pêşmerge, ne tenê li Kurdistanê yan ji bo azadîxwazên welatê me, belkî di çanda gelek neteweyên din de jî cih girtiye û gava ku ev peyve di her çand û kulturekê de û bi her hincetekê were gotin, qelafet û rûçikê mirovek şoreşvan, azadîxwaz, xwebextker, xwe nehezker û gelhez tê berçavan û dixuye.

**Silav li Pêşmerge baskê xurt û biqawet yê gel**

Pêşmerge ku wekî sembola xebata neteweya Kurd xwe derxistiye, hin caran tenê ger basa Kurd tê kirin, ne tenê Pêşmerge, belkî heta ji hemû Kurdan weke Pêşmerge dinêrin û ew kesên neyar in an



Hesen Şerefî, Cihgirê Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê

heta neşareza ne, li ser vê baweriyê ne ku Kurd avîndarê lûleya germ û qundaxa req ya tivingê ne. Na, Kurd neteweyek aştîxwaz, azadîxwaz, mafxwaz e, amade ye di pêxema aştî, azadî û mafxwaziyê de xebat û fîdakariyê bike û canê xwe bext û gorî bike. Eva xislet û taybetmendiya her xorteke neteweya Kurd e ku di çepera herî ya pêşîn wan de Pêşmerge cihgir bûye. Heke em bixwazin bibêjin ku kîjan roj, Roja Pêşmerge ye û me jêve be ku divêt em rojekê diyarî bikin ku di wê rojê de, Pêşmerge hemase afirandibe, parêzvanî ji maf û şeref û rûmeta neteweya xwe kiribe, dijkiryareke xuya û berbiçav li hember dîktatorî û desthilata zordariyê de ji xwe nîşan dabe, divêt em gişt rojên salê bi navê Pêşmerge bikin, ji ber ku tu rojek nîn e ku Pêşmerge tê de hemase nekiribe, Pêşmerge xwîn nedabe, fîdakarî, xwegorîkirin û jiyan li ser destdanîn ji xwe nîşan nedabe. Lê ya girîng eva ye ku hemû xelkê Kurdistanê û heta tev azadîxwaz û ew kesên ku gelê Kurd dinasin, yên ku tevî erk û taybetmendiyên Pêşmerge nasiyar in, di rojeke taybet de bihev re û bi ser hev rêz û hurmetê li Pêşmerge bigirin û bona vê armancê rojeke taybetî diyarî bikin. Diyarîkirina rojekê bi navê Pêşmerge, xelata herî biçûk û kêm e ku gelê wî û azadîxwaz dikarin bi vî xortê xebatkar û fîdakar yê neteweya me bide. Di nava gelê Kurd de jî roja 26’ê Sermawezê ji bo vê merem û armancê hatiye diyarîkirin.

Çima roja 26’ê Sermawezê? Ji ber ku hemû rojek hêjayî vê çendê ye ku bi navê Pêşmerge bihê kirin. Pêşmerge hêjayî vê çendê ye ku hemû rojekê rêz û qedr jê were girtin. Bîst û şeşê Sermawezê rojek e ku têde hêza çekdar ya Kurd, cihwarê dawî yê desthilata hikûmeta Pehlewî li bajarê Mehabadê yanî Şehrebaniya wî bajarî ji holê rakir û rewş ji bo desthilateke neteweyî pêk anî, hêzek ku piştre navê pîroz yê Pêşmerge jê hate bexşandin. Di wê rojê de ala Kurdistanê hat hildan, alayek ku heta niha jî Pêşmerge û xortên gelê Kurd di bin siya wê de xebatê dikin û ji bo bilindragirtina wê dixebitin. Wê rojê ku

di sala 1945'an de, him cihwarê dawîn yê desthilata Pehlewî ji holê hate rakirin, him jî ala Kurdistanê hate hildan, di sala 1984'an de, ji aliyê PDK Îranê ve weke Roja Pêşmerge û qedr û rêzgirtin ji Pêşmerge hate diyarîkirin. Lewra Partiya Demokrat hem avakerê hêza Pêşmerge û hem diyarîkerê Roja Pêşmerge ye.

**Silav li Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**

Xebata gel û neteweya me di nava qonaxên cur bi cur ên dîrokî de derbas bûye û di her qonaxekê de bi alav û amûrên wê demê xebat kiriye, gelek guhertin bi ser dinyaya îro de hatiye, awayên cuda cuda ên xebatê jî li rêya me ne, çeper û meydanên cur bi cur ji bo xebat û tekoşînê bo azadî û rizgarî û bi armanca bidestveanîna hêvî û xweziyên me di ser rêya me de ne.

Qet me xebata xwe bi yek awayê taybet ne girêdaye. Pêşmergeyê Kurdistanê jî tu car siwarçakê meydanekê û tenê qad û çeperek li xebat ji bo azadî û rizgariyê nebûye. Li wî cihî ku hewce bûye, berxwedaniyê bike û xwînê bide, leheng û qehremanê çeper û meydana şerê çekdarî bûye. Mînak û nimûneya fîdakarî û xwegorîkirinê bûye. Niha jî di her meydanekê de ku pêwîst be, di warê siyasî, ragihandin û piropagendeyê, dîplomasî, zanist û zanîn û xwepêelimandinê ve Pêşmerge hatiye fêrkirin û hîn bûye û xwediyê wan hemû taybetmendiyan e ku gerek Pêşmergeyeke vî serdemî hebin,

Hêja Hesen Şerefî:

## "Pêşmerge dest ji kar, jiyan û hemû îmkan û heyiniyên jiyanê di rêya azadî û bexteweriya gelê xwe de hilgirtiye, berdaye"

divêt em ji vê çendê bêtir ji bo vê meremê bihewlînin. Nabe em di roja rêzgirtin ji Pêşmerge de bas ji civatên xelkê Kurdistanê nekin, yên ku Pêşmergeperwer û penahderê Pêşmerge ne, yên ku xizm û kes û kar û xizmên Pêşmerge ne û Pêşmerge dihebînin û dihevînin, Pêşmerge ji bo lêre û wir vediguhezin, yên ku nan ji devê zarokên xwe vedigerînin, ji bo Pêşmerge şandine û bo Pêşmerge dihinêrin, yên ku evladên xwe di refa Pêşmergeyê Kurdistanê de cîgir kirine. Dehan û sedan çîrok û dastanên wilo ji fîdakariya yek bi yek ya civatên azadîxwaz ên xelkê hene ku mil bi milê Pêşmerge kirine û ji bo serkevtina Pêşmerge encam dane.

Neteweyek ku bi vî awayî ji bo azadî û serbestiyê xebatê dike, xortê wiha jî di çepera pêşîn ya xebatê de cihgir bike, gelek xwezayî û normal e ku Pêşmergeyên wî gelî serkevtinê bidest bixin, nemaze çaxekê ku civatên xelkê Kurdistanê herdem û heta ser piştevanê Pêşmerge û piştgirê Partiya avaker ya hêza pêşeng û diyarîkerê Roja Pêşmerge bibin.

**Silav li civatên xelkê Kurdistanê**

Silav li hemû ew kesên ku bîr û fikra wan ji bo azadiyê, hewl û cehda wan bidestxistina mafê neteweyî û kar û xebata wan di rêya serkevtina xebata neteweya wan de ye.

**Hevalên hêja û ezîz!**

Heke em bixwezin basa tevaya wan taybetmendiyên ku rûçik û kesayetiya Pêşmerge pêre tê naskirin, hemû ew erk û wezîfeyên ku pêvajoya xebata azadîxwazane ya gelê Kurd de li ser mil û stûyê Pêşmerge ne û biencam digehîne, heta bi fîdakirina sermaya herî hêja û giranbiha ya jiyanê, ew jî canê wî ye, bikin û bînin zimên, renge ne vegotina min û ne jî delîve û demeke wekî îro bikare bersivder bibe. Ez hêvîdar im rojekê di azadî û rizgariya neteweya me de dehan çîrok, pirtûk û fîlm û hwd... ji fîdakariya xelkê Kurdistanê û tevaya ew kar û xebatên ku Pêşmerge kiriye û di encamdan wan de gel alîkar bûye, werin berhev û tomarkirin.

Em hêviya vê çendê dixwazin û erxayîn in ku heta heta Pêşmerge dê xweştiviyê civatên xelkê Kurdistanê bibe, dê navê wî pîroz û qedirbilind bibe û xelkê Kurdistanê heta heta dê piştevanê xortên xebatkar û xwegorîker ên xwe di rêza pêşîn ya xebatê de bibin. Dema em li pêvajoya dîrok û xebata Pêşmerge dinihêrin, em dibînin tijî ji fîdakarî û cangorîkirin e, heta em bihostek ji axa Kurdistanê nabînin ku bi xwîna paqij ya şehîdek Pêşmerge an xorteke Kurd rengîn û sor nebibêt. Em girtîxaneyeke rejîmê nabînin ku xorteke xebatkar yê Kurd yan Pêşmergeyek têde nehatibe bendkirin. Ew kesane jî ku di van reşçalane de bimînin û bêtirs û biwêr mane, li ser armancên neteweya xwe biîsrar in û li ser rêbaza gelê xwe mane û berxwedaniyê dikin û serê xwe natewînin.

Çepera Pêşmerge tenê ne yek qad e, gelek in. Girtîxane ji bo Pêşmerge û ji bo xortên Kurd çeper e, xwendingeh û civak senger in, hemû ji bo xebat û pêşveçûnê, bo gihîştin bi azadiyê, bo serbestî û rizgariya neteweyî û bexteweriya gelê me çeper û senger in.

Rê û resma cejn û şahiyê ye, ji vê yekê bêtir dema we nagirim, gotinên xwe bi vê yekê bidawî tînim ku silavan bişînim bo Pêşmerge baskê biqawet û bihêz yê gel.

Silav li girtiyên siyasî û ji malbatên qedirbilind ên şehîdan û Pêşmergeyên Kurdistanê.

Silav li PDK Îranê, avakerê hêza Pêşmerge û diyarîkerê Roja Pêşmergeyê Kurdistanê.

Silav li civatên xelkê Kurdistanê pişt û penaha herdemî û heta heta ya hêza Pêşmergeyê Kurdistanê.

Her şa û kêfxweş bin – ev roja pîroz ji hemû aliyekê pîroz be.

**26.19.1385**
**17.12.2006**

Daxuyaniya Bîroya PDK Îranê Ya Nûnerayetiya Derveyî Welat:


# "Divêt Komara Îslamî Seba Cinayetên Dijî Mirovahiyê Li Dadgeheke Navneteweyî De Were Mehkemekirin"



**Dîmenek ji cinayeta hêzên Kurdkuj yên Komara Îslamî di sala 1979'an de**

Roja 28.11.2006'an, rojnameya "Wall Street Journal Online"ê hindek wêne li ser kuştinên bikom yên xelkê Kurdistana Îranê ji aliyê hêzên dijî gelî yên Komara Îslamî ya Îranê ve, weşandine ku perdeyeke her çend biçûk li ser cinayetên vê rejîmê li dijî gelê Kurdistanê rakiriye (hildaye).

Hêzên rejîmê piştî derkirina biryara"cîhad"ê li aliyê Xumeynî ve li dijî gelê Kurd, bi awayeke hov û berfireh destavêtin kştin û komkujiya xelkê li gund û bajarên Kurdistanê de. Piraniya cinayetên han dûr li wijdana hişyar a xelkê cîhanê û li dîrokê de veşartî man. Ev para kêm li van belgehên her çend biçûk ku ji aliyê wênegirek nenaskirî ve li cîhanê de belavbûn, bû hegera birîndarbûna wijdana mirovahiyê.



Wênegir Cehangîr Remzî

Yek ji van wênegirên nenaskirî, birêz Cehangîr Remzî ye, ku van rojan û bi boneya wergirtina xelata "Plîtzêr", wêneyên wî di malperên înternetî de hatin weşandin.

Piştî 27 salan bêdengiyê niha Cehangîr Remzî, xwe bi bîr û raya giştî re nasandiye, PDK Îranê ji tev Komeleyên parêzer ên mafên mirovan û herwiha organên navneteweyî dixwaze ku berpirsên vê rejîmê li dadgeheke navneteweyî de yên ku şahîdên weke Remzî, tê de amade bin, mehkeme bike.

PDK Îranê di vê derheqê de amadeyê hemû cure hevkariyekê ye tevî civaka navnateweyî û kom û komeleyên parêzer ên mafên mirovan.

**PDK Îranê Nûnerayetiya Derveyî welat – Parîs**
**21.12.2006**

www.arsivakurd.org

# Cejna Du Cejn

**Selîm Zencîrî**
**rondik24@yahoo.com**

Demeke dûr û dirêj e ku Îranî û gelek civakên din li destpêka demsala zistanê de yad û bîranîna şevekê pîroz dikin ku di nava gelên cur bi cur de nav û ramaneke xasmanî heye. Li Îran û bi taybet di nava Kurdan de şeva destpêka zistanê bi şeva **Çile** yan şeva **Yeldayê** hatiye bi nav kirin.

Çima şeva çile? Bi baweriya Îraniyan, peydabûna agir ji aliyê Hûşeng, Şahê Pîşdadiyan li 10'ê Rêbendanê de bûye, ji ber vê ku navbera destpêka meha Befranbarê heta 10'ê Rêbendanê 40 roj e, kal û pêşiyên me ew 40 rojên yekem bi Çileyê mezin û 20 rojên dawîn yên heyva Rêbendanê jî bi çileyê biçûk navkirine.

Gotineke pêşiyan di vê derheqê de heye ku wiha dibêje:


**"Çil çile ye, bîst beçe ye, çilên din û hindên din, cewab hat bihar hat".**

Peyva Yelda jî di bingeh de Siryanî ye û tê wateya zayîn û ji dayîkbûnê. Ev peyve di zimanê Romî de bi "Noêl û Natalîs" hatiye û bi wateya zayînê ye.

Yelda cejneke kevnar ya Aryayiyan e û vê şevê bi cejna li dayîkbûna Mêhr Mîtra dizanin. Pêrewên Mîtra hezar salan berî niha ev cejna pîroz kirine û di çanda xwe de cih dane.

Bi hatina ayînên din jî vê şevê pûte û girîngiya xwe ji dest neda û bû bi parek ji kultur û dîroka gelan. Romî piştî tevlîbûna bi Mesîhiyetê, heya 300 salan tu rojeke diyarîkirî weke rojbûna Îsa Mesîh nedinasîn û her rojbûna Mîtra pîroz dikirin û ramana ewqas cihgirtî bibû ku destê Kilîseyan derheq şoştin û paqijkirina vê cejnê di mêjiyê xelkê de girê dabû û Kilîse neçar man ku di sedsala 4'an de vê cejnê bi rojbûna Mesîh nîsbet bidin û bi sala taze yan cejna Kirîsmesê navkirin (Kirîst navê yekem meha sala wan e). Cihûyên Îranê jî hevdem digel şeva Yeldayê de cejna "Îlenot"ê ku gelek şibhê Yeldayê ye, birêve dibin.

Di rojhejmara dîrokê de, şeva Yelda bi dirêjtirîn şeva salê tê hesibandin, midehê tarîtî di vê şevê de 15 seet û 54 deqîqe ye. Çunku roj li livîn û bizava salaneya xwe de li dawiya demsala payîzê bi nizimtirîn cihê şefeqê di Başûra Rojhilatê digihîje ku dibe sedema kurtbûna rojan û zêdebûna dema tarîtiya şevê. Lê di destpêka zistanê de, roj dîsan ber bi Bakûrê Rojhilatê vedigere û encama vê jî zêdebûna jiyê ronahiyê û kurtbûna jiyê şevê ye. Belê Yelda şevek e ku bi hemû zulm û zordariya xwe avisê rojê ye, Yelda dawiya berxwedaniya zulmê û desthilata şevê ye. Yelda cejna tancxistina ser serê rojê bi hinceta padişahiya ronahiyê ye.




Li gor edet û tîtalên kevnar di vê şevê de, malbat û xizm û kes bi hev re di mala kalikên xwe de kom dibin û bi xwarinên xweş û mîweyên cur bi cur weke Şimtî, Hinar, Dindik* û ... mêvandariyê ji hev dikin û bi stiran, xweşî û şadiyê re vê şevê pîroz dikin. Diyar e kombûna wan di bingeh de hêcetek ji bo nûkirina tebayî û yekîtiya wan bi hevre ye.

Hêjayî gotinê ye ku Mîtraperestî li Kurdistanê ve ber bi cîhanê belav bûye, çimku yek ji şûnwar û peristgeha Mîtrayiyan ku bo çaxeke gelek kevnar vedigere, li Kurdistana Îranê ye bi navê şikevta Kereftû li nêzîk bajarê Seqizê û hin şûnwarên di şikevtê de li sedsala 3'an (zayînî) û di çaxê Şapûrê duyemîn de hatin hiloşandin.

Ya girîng li wir de eva ye ku cejna şeva Yeldayê serbarê wê ku bo me Kurdan weke tradîsyon û kulturê, cihê taybet yê xwe heye, lê girîngiyek din û bîranîna cejnek din di dîroka Kurdan de ye û di rastî de cejna du cejn e. Bîranîna bûyerek mezintir ji wan ku ne efsane û çîvanokî ye û ne jî pêwendiya mesebî heye.

Bîranîna şevek pir ji eşq û ronahî, belê yelda pêgiran û biheml e, pêgiranê mêrxas û aştîxwazek ji cinsê ronahiyê, û navdarek ji bihişta bizirbûyî ye, pêgiranê xebatkarekê ye ku bi hewar û nalîna dayîkên welat de hat. Belê yeldaya biheml, egîdek, Pêşmergeyek, lehengek, zanayek, rêberek, Pêxemberek û Dr. Qasimloyek bo me Kurdan anî dinê û stêrka pirnewreq ya asîmanê Kurdan teyîsand, ew stêrka ku bû roja hêvî û omîda gel.

Hêdî hêdî pirîşk û tîrêjên roja me, derdor jî vedigirt û welat ronahî dikir ku çevê tarîperestan karîna dîtina ronahî û germahiya roja Kurdan nebû. Lewma stêrka Kurdan rijandin, moma temenê wî vemirandin û koşa dayîkên welat tejî ji rondik kirin û gelê Kurd û partiya yadigara wî jî daxdar û kovandar. Lê bi koretiya çavê terîperweran, piştî çendîn sal ji avabûna vê roja şevqdar, niha jî tîrêj û çirûskên vê rojê, ronahîkerê rêya teng û tarî ya xebatkar û azadîxwazên Kurd û partiya yadigarê wî,( Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê) ye. Bila xatircem bin ku bi rijandina stêrka temenê Qasimlo, nikarin çirayê rêniwînî, ders û gotinên binirx yên wî bitemirînin û dîwarê ku bi xwe hoste û mîmarê wê bûye, biherifînin.

Her eva maye ku bêjim çawa ku zistan bi tarîtirîn û dirêjtirîn şevê dest pê dike, lê tovê geşekirina rengên bedew û bayê hênik û arambexş yê jiyanê di vê şeva tarî de, li Yeldayê de, berê xwe digre heya ku biharê bi xwe re bîne, lewre werin em jî bi hev re vê şevê ku rûpelek ji nasnameya me ye, pîroz bikin û peymanê nû bikin heta serkevtina yekcarî rêvîngên rêya şehîd Qasimlo bimînin.

(Çimku Hinar, Şimtî û Dindik bi sedema hebûna navik û tovê zor, sembol û nîşaneya zayîn û bergirtina zaf e)

# Konferanseke Çapemeniyê Ji Bo Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê, Rêzdar Mistefa Hicrî Hate Lidarxistin



Roja înê, 29.12.2006'an, seet 11'ê sibê di saloneke binkeya Deftera Siyasî ya PDK Îranê, bi beşdariya nûçegihanên medya û ragihandinên Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, Konferanseke Çapemeniyê ji bo rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê pariyê hate lidarxistin. Konferansa han ku 2 demjimêran dom kir, ji bo agehdarbûna raya giştî li ser helwestên herî dawîn yên PDK Îranê derbarê pirsên siyasî ên girîng di asta navneteweyî û Rojhilata Navîn û Kurdistanê de û nemaze biryara cezakirina Îranê ji aliyê Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî hatibû pêkanîn.

Beşeke girîng ya din a Konferansa Çepemeniyê ji bo bersivdana Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bi pirsên nûçegihanên beşdar di Konferansê de li ser cudabûn û veqetiyana hejmarek ji endamên partiyê hatibû terxankirin.

***Rapora kamil û berfireh ya Konferansa han li ser malpera me tê weşandin***

# Ji Du Xwendekarên Zanîngeha Kurdistanê Re 6 Meh Zîndan

Bi ser yek ji çalakên xwendekarî yên zanîngeha Kurdistanê, Aso Salih û Çiya Hicazî de, 6 meh zîndan hate sepandin.

Di vê derheqê de Aso Salih, da xuyakirin ku ev cezaye di pêwendiî tevî şikayeta Seyîd Mehdî Textêfîroze û Leyla Frûtmennejad' endamê/a Şewrên Îslamî yên bajrê Sine, bi ser de hatiye sepandin, ji ber ku me nûçeya pevçûna navbera wan her du kesane di şewra bjar de roj, 19.03.1385'an ya Rojî, li belavoka xwendekarî ya "Deng" de belavkiribû.

Xwedî îmtiyazê vê heftenameyê, Aso Salih got: "Belavoka "Deng" belavokeke xwendekarî bû û di çarçoveya zanîngehê

## Piştevanî Ji PDK Îranê Berdewam E

Piştî wê ku hejmarek ji endamên PDK Îranê cudabûna xwe ji refên xebata azadîxwazane ya vê partiyê îlan kirin, hêşta bi awayekî berfireh peyamên piştgiriyê ji aliyê xelkê mafxwaz yê Kurdistanê li bajarên cur bi cur her berdewam e. Herwiha li derveyî welat jî endam, dost û alîgirên partiyê piştgiriya xwe ji partiyê nîşan dane û ev kiryara wan kesan di vê qonaxa dîrokî û hesas ya neteweya Kurd de şermezar kirine. Ji bo agahiyên zêdetir seredana malpera kurdistanmedia.com bikin.

# Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

**16.12.1946:** Bo cara dawiyê nemir Mela Mistefa Barzanî ji Pêşewa Qazî Mihemed re xwast ku tevî Barzaniyan ji bajarê Mehabadê derkeve û xwe nede destê Rejîma Şahê Îranê û Mela Mistefa Barzanî amade bû ku di bin biryar û desthilata wî de bin. Lê Qazî Mihemed got: "herçend jiyana min dikeve tirsê, lê ez xelkê bicî nahêlim".

**17.12.1903:** Bo yekemîn car mirov karî amûra firînê çê bike û karê firînê jî serkevtiyane encam bide. Eva jî ji aliyê "Rayt" ve hate encamdan.

**17.12.1945:** Destbiserdagirtina binkeya Şaredariya bajarê Mehabadê ji aliyê xelkê ve weke nîşaneya dawiya desthilata Hikûmeta Navendî.

**17.12.1945:** Diyarîkirina navê pîroz yê Pêşmergê Kurdistanê, herwiha diyarîkirina Roja Pêşmerge di vê rojê de li sala 1985'an.

**17.12.1946:** Hatina hêzên rejîma Şah ji bo bajarê Mehabadê û bi dawî hatina temenê Komara Kurdistanê.

**17.12.1985:** Birêveçûna Kongireya 7'an ya PDK Îranê ku bi **Kongireya 40 sal xebatê** hatiye naskirin.

**17.12.1986:** Hunermendê mezin û navdar yê gelê Kurd, Mihemed Arif Cizrawî koça dawiyê kir.

**18.12.1985:** Fayiq Bêkes helbestvanê Kurd koça dawiyê kir.

**18.12.1998:** Hêzên Amerîkayê ji nişkêve êrîş kirine ser binkeyên eskerî yên Îraqê ku bi navê êrîşa **Riviyê Deştê** hatiye naskirin. Di vê êrîşê de ku bêtir ji 70'ê seetan domand, sed binkeyên eskerî yên rejîma Bees hatine bombaran kirin, ku Koşka Serok Komariyê jî yek ji wan binkeyan bû.

**21.12.1991:** Birêveçûna kongireya 9'an ya PDK Îranê di bin navê **Kongireya Qasimlo**.

**22.12.1930:** Stêrka geş ya neteweya Kurd der ket. Dr. Ebdulrehman Qasimlo, rêberê leheng û navdar yê gelê Kurd di bajarê Urmiyê, Herêma "Geliyê Qasimlo" de ji dayîk dibe.

**22.12.1952:** Serkeftina berbijarê PDK Îranê li bajarê Mehabadê di hilbijartinên gera 17'an ya Parlemana Şêwran. Ev hilbijartine ji aliyê dewleta Îranê ve hate betalkirin.

**23.12.1972:** Di welatê Nîkaragoyê de bi sedema erdhejeke xurt, pitir ji 10 hezar kesan jiyana xwe ji dest dan.

**23.12.1972:** Hêzên Yekîtiya Soviyeta berê "Kabol" a Paytexta welatê Efxanistanê girtin.

**24.12.1951:** Lîbiyayê serxwebûna xwe ragihand û di qareya Efrîqayê de bû welateke serbixwe.

**24.12.1968:** Yekemîn gera esmanî "Apalo 8" bi serkevtî gehîşte ser heyvê.

**25.12.1979:** Piştî peyama Xomeynî ya 17'ê meha Novemberê, ji bo rawestandina şer di Kurdistanê û soza çareserkirina doza kurd, desteya nûneratiya Kurd pêk hat û gelaleyeke 26 madeyî amade kir. Endamên nûnerayetiya Kurdistanê navhatibûn ji: Dr. Qasimlo, Şêx Îzedîn Hûsênî û nûnerê partiya Çirîkên Fedayî.

**25.12.1977:** Hunermendê binav û deng yê Cîhana Sînemayê "Çarlî Çaplîn" koça dawiyê kir.

**26.12.2003:** Bi sedema erdhejeke xurt li Bajarê Bemê li Rojhilata Îranê, nêzîk 40 hezar kesan jiyana xwe ji dest dan.

**26.12.1997:** Birêveçûna kongireya 11'an ya PDK Îranê li bajarê Kerkûkê bi navê **kongireya Xebatkarên Xweragir**.

**27.12.2004:** Bi egera bahoz û erdheja naskirî bi "Sonamî" li çend welatên Başûra Asiyayê de, pitir ji 150 hezar kesan jiyana xwe ji dest dan.

**28.12.1983:** Êrîşa hêzên rejîmê bo ser gundên "Girmav, Nirvan, Zerbenî û Tajanê" a ser bi bajarê Banê ji aliyê Pêşmergeyên PDK Îranê ve bi şikestê re berbirû bû û pitir ji 150 kes ji Xulamok û kirêgirtiyên rejîmê hatine kuştin. Lê mixabin du Pêşmerge bi navên **Salih Salihî** û **Resûl Xalidî** Şehîd bûn.

**28.12.1984:** Di şereke giran de tevî hêzên rejîmê li gundê "Dilke" li devera Serşanê, 4 Pêşmergeyên PDK Îranê li Hêza Efşîn bi navên **Ebûbekr Zihûrî**, **Cemal Moderis**, **Hesen Remezanî**, **Mihemed Mihemedî** şahîd bûn.

**31.12.1984:** Yek ji Fermanderên xweşmêr li hêza Pêşewa bi navê **Silêman Topî** li devera Berdereş a Bajarê Mehabadê şehîd bû.

www.arsivakurdi.org

# Jin Û Bizava Neteweyî Ya Kurd

**Meryem Hacîpûr**

Dîroka gelê Kurd weke mezintirîn neteweya bê dewlet li cîhanê tijî ji xebat, tekoşîn û xwegorîkirin di rêya gihîştin bi armancên neteweyî û herwiha bidestxistina maf û azadiyên demokratîk û berheq ên neteweyî ye. Şoreş û tevgerên berdewam yên gelê Kurd di seranserê Kurdistanê û tepeserkirina berdewam a wan ji aliyê desthilatên serdest li ser Kurdistanê û teslîmnebûna Kurdan, hemû mînakên xuya li dijî zulmêbûn û heqxwaziya gelê Kurd di dîrokê de bûye. Şoreşa Şêx Seîd û Seyîd Reza Dêrsîm li Kurdistana Bakûr û Şoreşa Şêx Mehmûd li Silêmanî, Şêx Ehmed Barzanî û Mela Mistefa Barzanî li Kurdistana Başûr û Cafir Sultan Hewraman û ... li Rojhilatê Kurdistanê mînakên baş ji bo vê rastiyê ne...

Lê yek ji girîntirîn bûyerê dîroka Gelê Kurd damezirandina Komara Kurdistanê ji aliyê Qazî Mihemed û pêş wê jî avakirina PDK Îranê bû. Em dikarin ji Komara Kurdistanê bi sedema hebûna sîstema perwerdehiya modern, sirûd, ala û zimanê neteweyî û ji hemûyan girîngtir hatina jinan bo nava meydana civakî, kulturî weke dewleteke Kurdî ya modern binav bikin. Komara Kurdistanê serbarê vê yekê ku tenê karî 11 mehan li ser pê raweste, lê di vê heyama kin û kurt de, gavên pir micid di pêxema pêşvebirina civakê di warên cur bi cur de, avêt ku em dikarin bi damezirandina Yekîtiya Jinan û teşwîqa jinan ji bo hatin bo beşdarkirina di warê civakî û kulturî weke mînak îşare bikin.

Jin ku nîviya civaka mirovahiyê pêk tînin, hertim mil bi milê mêran li dijî zulm û zordariyê di her civakekê de xebat kirine, herwiha jinên Kurd jî ku hertim di bin zulmeke du hember ji aliyekê bi sedema **Jinbûna** xwe û ji aliyeke din jî bi sedema **Kurdbûna** xwe de bûne, dîsan tu demekê ji xebat li dijî newekheviya neteweyî û regezî dest hilnegirtine û berdewam di dîrokê de karîn û şiyana xwe îsbat kirin û di warên cur bi cur de weke dîrok, siyaset, çand û heta leşkerî de jî cihê serbilindî û rûmeta neteweya xwe bûne.

Jinên weke Adile Xanima Osman Paşa, Qedem Xêr, Şa Xatûn keşa Neqedeyî, Minaxana Qazî, Bira Helîm, Miha Nêrgêz, Leyla Qasim, Leyla Zana, Mestûra Kurdistanî û gelek jinên navdar ên jinên din hemû ev şêrejinane bûn ku di xebat li dijî newekheviyê de pir dijwarî û zehmetî kişandine û jinên din jî bi hatin bo nava refên partiyên siyasî weke Pêşmerge bi xebata çekdarane li dijî zulm û zordariya desthilatên ser Kurdistanê û newekheviyên civakî rabûne.

PDK Îranê ku dîrokeke rohn û tejî serbilindî ya 61 sal xebat di pêxema gihîştin bi maf û azadiyên neteweyî û mirovahî de heye, hergav delîve û rewşeke baş ji bo domandina xebata jinan weke Pêşmerge li dijî newekheviyên zal li ser civakê pêk anîne. Jinên ku ji bo bidestxistina armancên mirovî û neteweyî yên xwe li ser gelek asteng û kospên civakî derbas bûne. Di PDK Îranê de jî jinan mil bi milê mêran di çeperên şer de karîn û şiyana xwe nîşan dane. Lê em nabe vê rastiyê ji bîr bikin ku hejmara jinan di nava hêzên Pêşmerge li hemû partiyên siyasî de gelek kêm in. Em dikarin civaka mêrserdest û kevneşop ya Kurdistanê bi astengên bingehîn li ser rêya hatina jinan ji bo çepera xebatê bizanin.

Lênihêrîneke kurt bi ser dîroka partiyên siyasî di Kurdistanê de, bi başî xuya dike ku nebûna jinan di asta rêberatiyê û weke hêza biryarder di hemû partiyên siyasî yên Kurdistanê de lawaz û kêmreng e û di Komara Kurdistanê de jî li her çende ku jin bi awayekî berbiçav hatine nav meydana xebatê û Rêxistina Jinan ava bû, lê dîsan jî mêrserdestî li ser civakê bi başî xuya ye û di rastî de biryarên siyasî hemû pêwendî bi mêran re hebû û jin di çarçoveya rêxistina jinan de bi awayeke xuya û berçav ji têkelî û beşdarî di siyasetê de hatine dûrkirin û di rastî de siyaset kareke mêrane bû.

Niha guhertinên civakî û kulturî yên kûr û berfireh ku di civaka Kurdistanê de pêk hatine, ku em dikarin nîşaneya eşkere ya vê di pêşkevtinû zêdebûna şaristaniyê ji 30 ji sedê di destpêkas şoreşa 1979’an bi 55 ji sedê ya niha û herwiha zêdebûna astê xwendewarî ji 42 ji sedê bi 72 ji sedê ya niha bibînin, hebûna jinan di civakê de ne mumkin ne kiriye û êdî takekes û civak nikarin bibin asteng.

Jin bi hatina zêdetir ya xwe bo nava çeper û meydanên xebatê mil bi milê mêran û xebat di pêxema bi destxistina mafên neteweyî û mirovî yên xwe, ne tenê dikarin li ser bizava neteweyî ya Kurd bandoreke mezin û erênî nebin, belkî dikarin civaka mêrserdest ya Kurdistanê ber bi guhertin û serbestbûn ji mêrserdestiya zal, pêş bibin.

Di dawiyê de divêt em bibêjin ku rastiyeke haşahilnegir e ku heke nîviya civakê ji xebatê bihê bêparkirin, ev kirine ne tenê kareke şaş û çewt e, belkî qebûl û erêkirina têkçûn û ne serkevtin di rêya gihîştin bi hêvî û armancên netewî û mirovî ye.



Li rastê Mehtab, li çepê Şîlan. Du keçên Pêşmerge di dema xwendina sirûdek şoreşgerî de

## Mafê Berbijarbûna Jinan Di Hilbijartinên Parlemana Mîrîtiyên Yekbûyî Yên Erebî

Bo cara yekemîn li Mîrîtiyên Yekbûyî yên Erebî, îsal jin dikarin bibin berbijara nûnerên Parlemenê.

Hêjayî gotinê ye ku 439 jin bûne berbijarên parlemanê û cehdê dikin ku 40 kursiyên parlemanê bi dest bixin. Herwiha di Mîrîtiyên Yekbûyî yên Erebî de, jinan mafê karkirinê hene, lê hêj jî ji gelek hiqûq û mafên civakî bêpar in.

Li piraniya welatên Erebî de mafên jinan bi xurtî tên binpêkirin û perçiqandina jinan bi awayekî tund ji aliyê dewlet û civakê ve dimeşe. Di van du salên çûyî de eva 2-3 nimûne ji mafê berbijarbûna jinan di welatên Erebî de bûn ku me dîtin. Lê hêjî rewşa jinan di wan welatane de pir dijwar e.

# Rêxistina Efûya Navneteweyî Derheq Îdamên Taze Li Xozistanê De Hişyarî Da Îranê



Rêxistina Efûya Navneteweyî di raporekê de derheq îdama 3 girtiyên Ereb yên Xozistanî, ji çarenivîsa 9 girtiyên gunehbar yên dosiyeya bombedanîna sala bihorî ya bajarê Ehwazê, nigeraniya xwe îlan kir.

Rêxistina Efûya Navneteweyî di 2 raporên kemilî li ser îdama 3 girtiyên Ereb yên Xozistanî di roja Sêşemî, 28'ê Sermawezê (19.12.2006), di girtîgeha Sipîdar ya Xozistanê, derheq metirsiya Îdamê ji bo gunehbarên din yên vê dosyayê, nigeraniya xwe îlan kir.

Efûya Navneteweyî dibêje piştî îdama Malik Benî Temîm, Elîriza Osakerê û Elî Metorîzade, egera îdama 9 kesên din jî heye.

Navê wan 9 girtiyan pêkhatine ji: Macid El Boxbîş, Mihemed çeibpûr, Ebdulhusêyn Herîbî, Xelef Xozeyrî, Qasim Silamet, Ebdula Silêmanî, Ebdulreza Senewatî Zereqanî, Ebdula Ferecula Çeib, Husên Merazî.

Efûya Navneteweyî îşare bi îtirafa 10 kes ji gunehbarên vê dosiyayê dike ku roja 13'ê meha Novembera 2006'an di kanala Xozistanê de belav bû.

Efûya Navneteweyî li ser vê baweriyê ye ku ew kesên ku di wan Îtirafane de bi Elî Motîrînejad hate nasandin, hemen Elî Metorîzade ye ku roja sêşemî, 19.12.2006'an tevî du kesên din yên gunehbar hate îdamkirin.

Herwiha Efûya Navneteweyî di rapora duyem ya xwe de Elî Meitorîzade, weke yek ji damezirînerên partiya Elwefaq di Xozistanê dide nasandin.

Efûya Navneteweî zêde dike ku cendek (meyt)ê 3 îdambûyên Xozistan hetanî niha radestî malbatên wan nehatiye kirin û tirsa vê heye ku ew di goristaneke giştî ku navê vê "Lenet Ava" ye, bihên veşartin.

Herwiha rapora duyem ya Rêxistinê xuya dike ku Fehîme Îsmaîlzade ku tevî mêrê xwe Elî Meitorîzade di halekê de ku 8 mehîpêgiran bûye, hatiye girtin û beriya ku bi 15 sal cezaya girtîgehê bihê mehkûmkirin, zarokê xwe di girtîgeha bajarê Karonê aniye dinê.

Efûya Navneteweyî herwiha zêde dike ku Elî Meitorîzade piştî girtinê di ciheke nediyar hatibû hepsîkirin û li wir de tevî îşkenceyê berbirû bûye.

Efûya Navneteweyî ji serokê Olî û serokê Dezgeha Dadê ya Komara Îslamî daxwaza ragirtina Îdama gunehbarên din yên vê dosyayê dike û ji kom, komele û kesayetiyên mirovdost daxwazê dike ku bi şandina nameyan ji bo Xameneyî û Mehmûd Haşimî Şahrûdî, vê daxwazê ji wan 2 karbidestên rejîmê bikin.

---

Mizgînî:

# YCDK Îranê Li Welatê Norwejê Bû Endamê Fermî Yê Komîteya Peywendî Û Zaniyarîdanê Ya Neteweyên Yekbûyî Li Norwejê

Ciwanên xebatkar û dilpir li hêviya Kurrdistanê!

Endamên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ya Kurdistana Îranê!

Em bi kêfxweşî ve we agehdar dikin ku piştî hewildan û xebateke zaf ya Komîteya Giştî ya YCDK Îranê li welatê Norwejê, YCDK Îranê li wî welatî, bi awayekî fermî bû endamê Komîteya Peywendî û Zaniyarîdanê ya Neteweyên Yekbûyî (UN)ê li welatê Norwejê û bi vî awayî rêxistina me gaveke din a zanistî û dîplomasiyê ber bi pêşve avêt. Em hêvî dikin ku di pêşerojê de bêtir bikarin ji vê rêyê ve organ û kes û aliyên din nas bikin û cehd û hewlê bidin bi qazancê doza rewa û berheq ya gelê me, ji wan mafên ku me weke endambûna xwe hene, mifahên erênî û pêwîst werbigirin.

Heke caran destê gelê Kurd bi binke û binyatên cîhanî û navneteweyî nedigihîşt, îro êdî ew pêvajo dawî pê hat û em bi hev re dikarin li gelek deriyên din bixin û Kurd û doza wî ya berheq bikin mijareke navneteweyî û gelek deriyên din li dû hev jêre vekin.

Her li ser vê bingeha netewî bû ku YCDK Îranê li gorî şîret û rênimayiyên PDK Îranê, hate avakirin û em hemû aliyekê jî piştrast û bêxem dikin ku gavên me ji bo pêşve, bi mifahwergirtin ji şêwaz û metodên akademî û zanistî dê berdewam bibin û roj li pey rojê zêdetir ji bo navneteweyîkirina doza Kurd hewlan bidin û xebatan bimeşînin!

Em hêvîdar in ku di pêşerojê de serkevtinên zêdetir ên bi vî awayî bidestve bînin!

**Komîteya Giştî ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ya Kurdistana Îranê, Norwejê**
**14.12.2006**

---

# Biryarnameya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî Li Ser Binpêkirina Mafên Mirovan Di Îranê De



Civata Giştî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ku 193 welat endamên wê ne, di biryarnameyekê de ku bi 73 dengên Erê, 50 dengên Dijber û 55 dengên bêalî hate pejirandin. Di vê biryarnameyê de li hember binpêkirina berfireh ya mafên mirovan bi destê Rejîma Komara Îslamî nerazîbûn û nigeranî hatiye xuyakirin.

Di vê biryarnameyê de Civata Giştî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî nigeranî û nerazîbûna xwe ji îşkence û dadgehîkirina girûpên parêzer yên mafên mirovan, neraziyên siyasî û olî, rojnamevanan, endamên parlemanê, xwendekar, melayan û mamostayên zanîngehan, nivîskarên malperên taybet (weblag) û endamên Yekîtiyên kedkaran îlan kir.

Di biryarnameya han de rexne û gazinde ji Rejîma Komara Îslamî hate girtin û têde hatiye ku ev rejîmê hertim dijberê pîvan û mercên navneteweyî yên mafên mirovan bûye.

Biryarnameya Neteweyên Yekbûyî Rejîma Komara Îslamî bi sedema bikaranîna îşkenceyê, îdamên giştî, newekhevî li dijî jinan û kêmaniyên neteweyî û olî bi sûçbar dizane.

Herwiha biryarnameya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî daxwaz ji Komara Îslamî ya Îranê dike ku rêz û hurmetê ji mafên kamil yên mirovan ji bo kombûn û azadiya raderbirîn û axavtinê ewle bike û dest ji êşandin û acizkirina çalakên mafên mirov û dijberên siyasî berde û mifahstandin ji îşkenceyê qedexe bike û bi rêz û hurmet ve pêvajoya kamil ya birêvebirina qanûnê ewle bike.

Komara Îslamî berdewam seba binpêkirina mafên mirovan, bo mînak îdama nûciwanên temen kêmtir ji 18 salan û bikaranîna cezayên xurt ên din weke şelaqlêdan, birîna endamên laşê mirovan, girtin û binçavkirina neyar û çalakên siyasî û daxistin û qedexekirina rojname û malperên înternetî ketiye ber êrîş û rexneyan.

**Jêder: "Radiyo Farda"**

www.arsivakurd.org

# "Şeva Herî Dirêj"



**Lokman Polat**

Ez ji nivîsên hersê Altanan jî hez dikim. Li rojnameya Milliyetê nivîsên Çetîn Altan, di rojnama Hurîyetê de nivîsên Ahmed Altan û di rojnama Star û Sabah'ê de şîroveyên Mehmed Altan dixwînim. Dema ku pirtûkên nû yên van hersê nivîskaran derdikevin ez dikirim û dixwînim.

Ji bo ku întresa min li ser edebiyatê ye, çi romanên Ahmed Altan derketine, min kirîye û xwendiye. Herî dawî min romana wî ya bi navê " Şeva Herî Dirêj" kirî û xwend. Xwendina romanên Ahmed Altan qet min aciz nake û berevajê wê pir xweşa min diçe. Hinek romanên hinek nivîskaran hene, ez nikarim heta dawî bixwînim. Xwendina wan min aciz dike, roman min nakişîne nav xwe û ez tu tehm û lezeteke ji xwendina wan wernagrim, loma jî nîvî de dihêlim. Min hêj tu romaneke Ahmed Altan nivî nehêştiye, min temamî hetanî dawî xwendiye.

Hemû romanên Ahmed Altan bi min xweş tên, lêbelê ev romana wî ya dawî "Şeva herî dirêj" bi min hîn xweştir hat. Bûyera vê romanê li Kurdistanê derbas dibe. Mijara romanê kuştina keç û jinên kurd in û herweha kuştina zarokekî kurd ê 12 salî ye. Navî vî zarokî 12 salî "Hêja" ye. Ev bi şêweyeke "qesas ne diyar e" tê kuştin. Hinek leheng û fîgurên romanê kurd in û navên wan jî kurdî ne. Herwekî "Rojda" , "Hêja" , "Berrîn". Herçiqas Ahmed Altan di romanên xwe yên din de jî –bi hindikayî be jî – behsa kurdan dike, lêbelê di vê romanê de hîn pirtir behsa kurdan û rewşa gelê kurd dike.

Romana Ahmed Altan ji hêla mijara xwe ve balkêş e û ji hêla naveroka xwe ve romaneke gelek dewlemend e. Di vê romanê de têkiliyên sosyal civakî û herweha têkiliya jin û mêrî, sedaqat û xapandin, xweşî û nexweşiyên evînê û evîndariyê, sedemên kuştina keç û jinên kurd li dewerên Kurdistana bakur û gelek tiştên civakî, bûyerên rojane û taswîra gund û cografya bakurê Kurdistanê bi şêweyeke edebî hatiye ravekirin.

Heyeteka îlmî/zanîstî ji bo lêkolîna sosyolojîk pêk bîne diçe dewereke Kurdistana bakur û li gundek bi cih û war dibe û dest bi lêkolînên sosyolojîk dike. Di romanê de çend zanîstên /îlîmdarên biyanî –ewropî (Jacquesê Îtalî û sosyolog Beatrice ê Fransî, psîkyatrîst Gunterê Spanyolî, Doktror Amy'ê Almanî ) jineka tirk a bi navê Yelda, zilamekî ku berê komser bûye û paşê dev ji polîsiyê berdaye û şirketa ewlekariyê ya parastina şexsan damezrandiye û kurdên bi navê Rojda, Hêja û Berrîn hene. Dekora romanê bi rewşa gelê kurd, kuştina keç û jinan ji bo namûsê û kuştina zarokekî 12 salî ve hatiye nexşandin.

Lehenga romanê Yelda hem lêkolîna xwe ya sosyolojîk didomîne û hem jî bi evîndarê xwe Selîm re têkiliyên xwe bi riya telefonê pêk tîne. Yelda bi evîndarê xwe ve gelek girêdayî ye, lêbelê carna difikire ku sedeqeta xwe bişkîne û ji xwe re bi kesên din re raze, pevşabûnê pêk bîne. Ew zanê ku evîndarê wê Selîm ew dixapîne û bi jinek din re şadiman dibe. Loma jî herdem bi şik li Selîm dinêre. Ji xwe hatina Yelda'yê ya bi heyeta lêkolînê re ji ber sedemên daxwaza xwe ji Selîm dûrxistinê ye. Di cihek de Yelda dixwaze xwe ji Selîm dûr bixe û di cihek din de hertim wî difikire û di heş û eqilê wî de Selîm heye. Ji ber meraqa gelo Selîm likur e? Niha çidike? Û filan û bêvan her roj ji Selîm re telefon dike û dipirse; tu tenêyî? Yek li cem te heye? Yelda bêhemdê xwe ji dûr ve jî be dixwaze Selîm kontrol bike. Di esasê xwe de Yelda bi heq e ku ji Selîm şik dike. Lewre têkiliyên Selîm bi jineka ku navê wê Fahrûnîsa ye re heye. Çawa ku Yelda ji Selîm re telefon dike, herweha Selîm jî hercar ji Fahrûnîsa re telefon dike.

Di romana Ahmed Altan ya bi navê "Şeva herî dirêj" de behsa rewşa gelê kurd jî tê kirin. Ji romanê diyar dibe ku cih û warê romanê heremeke Kurdistanê ye. Cihê bûyeran û lêkolînê gundên Kurdistana bakur in. Gundên xêzan, feqîr û belengaz in. Di van gundan de gundî feqîr û perîşan, axa jî xwedî hebûna aborî ne, anku dewlemend in. Di gundan de xaniyên herî xweş xaniyên axa ne. Taswîra xanî û baxçe, deşt û çiyayên herêmê taswîreke xwezayî –natur- û egzotîk e. Taswîra nivîskar a derbarê deşta Mezopotamyayê ya efsanewî ve gelek manedar e û balkêş e. Ahmed Altan behsa pisporên asurî, fîlozofên babilî, hespên araban û şerkerên kurd dike. Ew kurdan weke mileteke – neteweyeke mêrxas, şerker, şervan dibîne. Ew behsa zimanên ku li bajarê Kurdistanê li Mêrdînê tê axaftin anku zimanê kurdî, ermenî, asurî, tirkî û erebî dike. Li bajareke Kurdistanê axaftina ewqas zimanan dewlemendî, pirrengî û şaristaniya axa Kurdistanê dide nîşandan. Di romanê de taswîra bajarê Mêrdînê wisa baş û xweş hatiye ravekirin ku, mirov dixwaze here Mêrdînê û bi şev li xweşikbûna bajêr binêre. Yê ku Mêrdînê nedîtine, dema vê romanê bixwînin dê bixwazin ku bajarê Mêrdînê bibînin.

Taybetiya vê romana Ahmed Altan yek jê jî ev e ku; ev pirtûk pirtûka yekemîn a ku herî pir hatiye çapkirin e. Ev pirtûk 500.000 hezar hatiye çapkirin. Li Tirkiyê hetanî niha pirtûka ti nivîskarek di yek carek de ewqas nehatiye çapkirin. Ji xwe li Tirkiyê nivîskarên ku herî pir pirtûkên wan têne firotin Ahmed Altan, Yaşar Kemal, Orhan Pamuk û Murathan Mungan in.

Bi min, divê her kurdê ku dikare bi tirkî bixwîne, vê romana Ahmed Altan ya bi navê " Şeva Herî Dirêj" û hemû romanên wî yên din bixwîne.

## Xwendekarên Kurd Li Zanîngeha Urmiyê, Şevbêrka Helbestan Lidarxistin

Xwendekarên Kurd ên Zanîngeha Urmiyê şeva şemî, 02.10.1385(23.12.2006)'an, şevbêrekeke helbest û muzîka Kurdî di saloneke vê zanîngehê de lidarxistin.

Ew rê û resm ku ji aliyê tayê Kurdî ya navenda "Îran Zemîn"ê ve ku navendeke xwendekarî ye û li ciyê navenda çand û wêjeya Kurdî ya daxistî a bi navê Ronahî de çalakiyên xwe didomîne, hat birêvebirin û zêdetir ji 1500 xwendekaran beşdarî tê de kirin.

Li gorî malpera Urmiyê, 3 girûpên cuda yên muzîka Kurdî beşdarî rê û resmê bibûn û bernameyên xwe birêve birin û çendîn xwendekarên Kurd jî helbestên xwe pêşkêşkirin ku pêşwazieyke germ ji aliyê beşdaran jê hate kirin.

Di dawiyê de rêz û qedirgirtin ji çalakên xwendekarî yên navenda qedexekirî ya **"Ronahî"**yê û kovarên daxistî yên bi navê **"Tirîfe"** û **"Manşêt"**ê hate girtin û xelat ji wan re hate pêşkêşkirin.

# Çanda Xwendin Û Nivîsandinê

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Îro gelek welatên pêşketî û civakên pêşverû bi saya xwendin û nivîsandinê gihîştine merheleyeke payebilind û rûmetdar. Çanda xwendinê, bi nivîsandinê re derketiye holê. Kîjan gel an jî civaka ku bi xwendinê nasdar bûbe, her wiha nivîsandina wan jî ew çend pêş dikeve. Di van civakan de xwendin ji bo mirovan dibe wekî kurmekî bêhedan û nivîsandin jî dibe hînbûniyeke erênî.

Gava ku mirov dêhna xwe dide civakên dinê, pêşketin û serkeftina wan beramberî xwendin û nivîsandina wan pêk tê. Li aliyê din, gava ku mirov bala xwe dide civakên paşmayî û bindest jî , tevê wan ji xwendin û nivîsandinê dûr û bêpar mane. Ev jî vê rastiyê derpêş dike ku pileya dewlemendî, şarmendî û şarezabûna civakekê rasterê bi mêjera xwendin û nivîsandina wê ve girêdayî ye.

Xwendin, livbaziyeke payeberz a ku mirov ji asta lewrirtiyê rizgar dike û derdixe pileya herî birûmet û serbilind. Ji do heta îro, çi feylesof, zanyar, ramanwer, peyamber, pêşeng û ronakbîrên ku hene pêşî meyla xwe dane ser xwendinê û nivîsandinê. Bi saya xwendin û nivîsandinê, zanîna xwe pêşve birine; hewm û komasiyên xwe yên zanistî, pêşî bi hemsal û hemdemiyên xwe re parve kirine. Zanîn û daneyên ku ji hêla van zanyar û ramanwerên afirêner ve hatine dahênandin wekî mîrateyeke mayînde, radestê nifşên mirovahiyê bûne. Û ev kevneşopî her ku diçe xwe nûtir, xurtir û şarezatir dike. Beramberî vê çanda kevnar, gelek alav û amrazên teknolojiyê, şaxên zanînê û cureyên şaristaniyê jî derketine holê. Ji bo wê xwendin tenê ne hînbûniyeke kesane ye; her wiha ew têkoşeriyeke hişmendî ya ku gelek şoreşên civakî di xwe de dihewîne ye jî.

Xwendin, bêguman bi nûvedaniya(îcada) nivîsê re derketiye holê. Belê nivîsandina mirov jî her wisa bi saya xwendinê pêşve çûye û kemiliye. Ev kemilîna nivîskî jî ji vekirina gelek deriyên xêrê re bûye hincet.

Beriya nivîsê, şûr û mertal, tîr û kevan û şûr û rim hebûn. Mirov lehengiya xwe bi van alavan re dikirin der; hêz û qaweta xwe bi pozber û dijberê xwe dide peyitandin. Li şûna pênûs û kaxizên ku mirov pê têne şardekirin û şarezakirin, alav û amrazên kuştinê yên ku mirov hovebertir û kovîtir dikirin, hebûn. Mirovên hoveber, bi hejmara kuştiyên xwe, bi dagirkirin û talankirina erdnîgariyên dinê û bi şer û pevçûnên bênavber hêzdar û pozbilind dibûn. Belê îro mirovên şareza bi xwendin û nivîsandina xwe, bi zanîn zanyariya xwe û ber û berhemên xwe rêzdar û serbilind dibin.

Îcar bi giştî hewcedariya tevê mirovahiyê belê bêtir jî pêdiviya civakên bindest û paşverû bi xwendin û nivîsandinê heye. Li kîjan devera dinê dibe bila bibe, heke civak an jî gelek bixwaze xwe ji bindestî û rebeniyê rizgar bike, divê pêşî ji xeşîmî û nezaniyê bidûr bikeve û xwe nêzîkî xwendin û nivîsandinê bike. Pêşketina xwendin û nivîsandina wê civakê, teqez dê bibe sedema jiholêrakirina nezanî û xizaniya wê jî.

Kilîda hemû deriyên girtî xwendin û nivîsandin e. Heta ku çanda xwendin û nivîsandin li ser civakekê ferz nebe, berxwedîtin û şabûna wê civakê zû bi zû pêkan nabe. Heta ku hejmara nivîskar û xwendevanên civakekê ji nezan û keslanên wê zêdetir nebe, ew civak tu car nikare xwe jidilîtî û benitiya civakên serwer û desthilatdar rizgar bike. Û her wiha heta ku hejmara pirtûkxaneyên civakekê ji qehwexaneyên wê zêdetir nebe, azadî û serxwebûna wê civakê jî qet pêkan nabe.

Hemû dem û domanên ronîdariyê bi xwendinê re der bûne. Tevê şoreşên hişmendiyê bi saya xwendin û nivîsandinê bi ser ketine. Peresîn û kemilînên civakî yên demên nêzîk tev bi xwendin û nivîsandinê re pêk hatine. Zanîna pozîtîf û teknolojiya îroyîn bi saya xwendin û nivîsandinê gihîştine lûtkeya dawîn. Ber û berhemên wêjeyî, çand û kelepûrên kevnare, şahkar û serberhemên hunerî... û hwd. hemû li ser riknê xwendin û nivîsandinê ava bûne. Civat û neteweyên ku ji xwendin û nivîsandinê bi dûr ketine, ji xwîner û nûserên xwe jî bi dûr ketine. Gel û civakên ku ji xwîner û nûseran xwe bi dûr ketine, her wiha ji şaristaniyên gerdûnî jî bi dûr ketine.

Çawa ku axaftin û fikirandin ji bo her mirovî/ê wekî du pêdiviyên bingehîn yên komeleyî têne dîtin, divê xwendin û nivîsandin jî wekî du diviyatiyên jênager werin dîtin û pejirandin. Hekena, dê axaftin qels û fikirandin jî lewaz bimîne û jiyan jî bêwate... Ji lewre her fikirandin bi xwendinê û her axaftin jî bi nivîsandinê têkûz û kamil dibe. Gotina kin, azadiya civakekê girêdayî çanda xwendin û nivîsandina wê guncan û pêkan dibe.

Helwêst

## Daxuyaniyek Ji Bo Hemû Xelkê Kurdistanê Û Bi Taybet Akinciyên Bakûrê Kurdistana Îranê



Silêman Keleşî

Em ji hemû aliyekê re radigehînin ku hinek kesên derfetperest û nenaskirî di bin navê Partiya Demokrata Kurdistana Îranê(Ararat), ji vê rewşa cudabûna hinek ji Kadro û Pêşmergeyên PDK Îranê mifah wergitine û malpereke înternetî binavê Malpera Partiya Demokrata Kurdistanê(Ararat) vekirine ku bi danîna wêneyên çendîn şehîdên Bakûrê Kurdistana Îranê di malperê de, dixwazin ji rêya wan wêneyên pîroz ve ji bo xwe piropagendeyê bikin û îtibarê bidest ve bînin.

Lewra em ji rêya vê daxuyaniyê ve radigihînin ku van kesane tu pêwendî û têkiliyek bi Kadro û Pêşmergeyên Bakûrê Kurdistana Îranê û ne jî PDK Îranê re hene.

Van kesane bi nivîsandina navê hinek ji Kadroyên wê deverê û danîna wêneyên şehîdên serbilind ên vê herêmê, tenê dixwazin di vê rewşa hesas de niştecihên Kurdistanê bi giştî û nemaze xelkê qehreman û şoreşger yê vê herêma Kurdperwer û netirs bixapînin û ji seha paqij û Kurdîtiya wan ji bo qazanc û berjewedniyên xwe ên taybetî, derbeyan li tevgera me bixin û xizmetekê bi dijminên gel û partiyê bikin!

Eva di demekê de ye ku xelkê qehreman û dilsoz yê Kurdistanê gelek ji vê çendê şiyartir in ku hinek kes bi nivîsandina navê beşek ji Kadroyan û herwiha Kopîkirina wêneyên şehîdên vê devera Kurdistana Îranê bikin, bikarin dikan û bazara xwe ya reş bi wan germ û gur bikin.

Lewra ye em radigehînin ku van kesane tu têkiliyek bi me re nîn e.

Em kopîkirina nav û wêneyên şehîdan bi bêy izn û agehdarî mahkûm û şermezar dikin.

**Serkeve tevgera gelê Kurd bi rêberiya PDK Îranê**
**Silav li şehîdên gel û Partiyê**
**Silêman Keleşî**
**14.12.2006**

www.arsivakurd.org

## BBC Dixwaze Fîlmeke Dekomêntî Li Ser Koma Muzîkê Ya Kamkaran Çê Bike

Kanala Televîziyonî a "BBC" dixwaze fîlmeke dêkomêntî li ser xebat, tekoşîn, berhem û jiyana endamên girûpa Kamkaran çê bike. Lê ev kare hêşta neketiye di qonaxeke micid de.

Herwiha li gor jêderên baskirî divêt bo çêkirina vê fîlmê izin ji dewleta Îranê bihê wergiritin, jiberku biryar e ku ew fîlma dêkomêntî li bajarê Sinê ku pêştir cihê jiyana Kamkaran bûye û herwisan di Tehrana paytextê Îranê de bihê wênegirtin.




Girûpa Kamkaran ku pêkhatiye ji malbateke 15 kesî, CD a wan ya vê dawiyê bi navê "Hetawî Mestan" heya heyamek din karê xwe yê tomarkirinê dets pê bike. Ev CD pêkhatiye ji 6 parçe muzîk û stranan ku bi dengê hunermendê stranbêj "Peyam Ezîz" û helbestên "Mewlana" ji aliyê Orkêstariyayê mezin bi her 3'ê zimanên Kurdî, Farsî û Erebî tê pêşkêş kirin. Koma navhatî bi hinceta sala Pêxemberê mezin û li ser daxwaza hewzeya çandî a Tehranê wê CD çê dike.

Koma muzîka Kamkaran karîn bi berdewambûn û piştrastbûn bi berfirehiya di warê muzîkê de, navekî xweş û bedev ji xwe û girûpa muzîkê li herêma Kurdî re bidest bixin. Koma muzîka Kamkaran di nava girûpên cîhanê de, kom û pêkhateke taybet in, çi ji aliyê afirndin û vehûnandin û herwih eva ku ev xûşk û birayane di bin sêya hunera kesayetiyekî weke mamosta "Hesen Kamkar" û cesûrî û wefadariya daykeke bisoz û helbestnas "Zemane Behramiyan" perwerde bûn û bi hevre bi yekrêzî û yekdilî ve xebat kirine û karîne ji aliyê pêşkêş kirin û afirandina berhemên balkêş ve sinoran derbas bikin.

# Konferansa Muzîka Kurdî Bi Dawî Hat




Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM)ê, bi dirûşma **"Ji paşerojê heta îro ve û ji îro ber bi pêşerojê ve Konferansa Muzîka Kurdî"** di nava rojên 23 û 24'ê meha Decembera 2006'an ya Zayînî, bajarê Amedê kire mêvandarê yekemîn Konferansa Muzîka Kurdî û dawî bi kar û xebartên xwe ên serekvtî anî.

Konferansa Muzîka Kurdî ji raya giştî re encamnameyek belav kir. Di encamnameya Konferansa Muzîka Kurdî de hinek ji biryarên ku li Konferansê hatine wergirtin, weha ne;

*Di vê Konferansê de carek din piştrast bû ku Kurdistan, di warê pirçandî, pirolî û hunerê de coxrafiyek dewlemend e. Ji ber vê yekê, divê tevê van nirxan bên parastin û li ser wan lêkolîn bê kirin.*

*Divê bi xebatên akademîk û zanyarî giranî li ser muzîka Kurdî bê danîn û bi zanyaran re pêwndî bê danîn daku muzîka Kurdî bigrin rojeva xwe û piştgiriyê bidin pê.*

*Muzîsiyen û lêkolînerên ku li ser muzîka Kudî dixebitin, bên birêkxistin û bi berfirehî bixebitin.*

*Bi piştgiriya sazî û muzîsiyenên Kurd, di derbarê muzîka Kudî de proje bên amadekirin û pêşkêşê saziyên navneteweyî yên wek "UNESCO", Netewên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê û hwd. bê kirin. Ji bo amadekirina arşîv û berhevkirina nirxên muzîka Kudî, li her cîhên ku Kurd lê dijîn, grûbên xebatê bên avakirin û bi xebatek hevbeş, saziyên di vî berbarî de bên çêkirin.*

*Ji bo ev belavbûn û perçebûna navbera muzîsiyenên Kurd ji holê rabe, divê Yekîtiya Muzîsiyenên Kurd bê avakirin û her muzîsiyenên beşdarê vê Konferansê bibin endamê xwezayî yê Yekîtiya Muzîsiyenên Kurd.*

*Ji bo avakirina Konserwatuwarên Kurdî, hewldanên pêwist bên kirin...*

**Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:**

**1. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.**
**2. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.**
**3. Hejmarên 1-9'ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.**

### Bersiva Sudoku a Hejmara 53'an

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 1 | 4 | 5 | 9 | 8 | 6 | 7 | 2 |
| 6 | 2 | 5 | 7 | 3 | 4 | 1 | 8 | 9 |
| 7 | 8 | 9 | 6 | 1 | 2 | 4 | 5 | 3 |
| 8 | 6 | 1 | 4 | 7 | 9 | 3 | 2 | 5 |
| 2 | 9 | 7 | 3 | 6 | 5 | 8 | 4 | 1 |
| 4 | 5 | 3 | 8 | 2 | 1 | 7 | 9 | 6 |
| 1 | 4 | 8 | 2 | 5 | 3 | 9 | 6 | 7 |
| 9 | 7 | 2 | 1 | 4 | 6 | 5 | 3 | 8 |
| 5 | 3 | 6 | 9 | 8 | 7 | 2 | 1 | 4 |

### Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 4 | | | 8 | 5 | 3 | | 7 |
| 3 | 2 | 7 | | 1 | | | | 5 |
| | 8 | | 4 | 3 | 7 | 1 | 2 | |
| | | 3 | | | 8 | 6 | | 4 |
| 8 | 9 | 4 | | | 1 | 5 | 3 | 2 |
| 6 | | 2 | 3 | 9 | | | 1 | |
| 2 | | 5 | 6 | 7 | | 8 | | 1 |
| | | 8 | | 4 | 2 | | 5 | |
| 4 | 1 | | 8 | 5 | | 2 | | |

www.arsivakurdi.org

agiri

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**




# Festîvala Navneteweyî Ya Kurtefîlman Bi Dawî Hat



Piştî pêşkêşkirina nêzîkî 50 kurtefîlman li Festîvala Navneteweyî ya Kurtefîlman ku 4 rojan dom kir û li Hola Gel ya bajarê Hewlêrê birêve çû, roja 28/12'ê di rê û resmeke taybet de û bi amadebûna Wezîrê Rewşenbîriyê, birêz Felekedîn Kakeyî û hejmareke zaf ji hunermendan, sînemakeran û hunerdostan, xelat bi ser baştirîn kurtefîlman de hatin dabeşkirin.

Gotarên rêveberiya sînemayê li Wezareta Rewşenbiriyê, komîteya dadweran û nirxandina fîlman û Wezîrê Rewşenbîriyê hatin xwendin û piştî ku pîrozbahî li sînemakaran û derhêneran û beşdarên festîvalê kir Wezîrê Rewşenbiriyê ragihand ku di bernameya nû ya wezaretê de % 80 ê karên me bo warê sînema û pêşxistina sînemaya kurd hatine terxankirin.

Her weha amaje bi duristkirina bajarê sînema û damezrandina dezgeheke taybet bi sînemayê kir ku desthilata wê firehtir be.
Piştî pêşkêşkirina gotaran, xelat bi ser baştirîn fîlmên festîvalê de hatin dabeşkirin ku pêkhatibû ji sê fîlman:
-Kurte fîlma **Rêbwaranî Dolî Henar** ji derhînana **Eşkan Ehmedî**, berhema kurdistana Rojhilat.
-Kurtefîlma **Kamêra** ji derhînana **Seyfedîn Cebarî**, berhema Kurdistana Başûr.
-Kurtefîlma **Mêlodiya jiyanê** ji derhînana **Hişyar**



**Zêro**, berhema Kurdistana Başûr.
Herwiha çend kompaniyayên kurdî jî xelat bi ser gelek kurtefîlman de dabeş kirin û festîvalê dawî bi karê xwe anî.

**PUKmedia**

# "MIT"a Turkiyê Dibêje Nabe Kerkûk Bikeve Destê Kurdan




Li gorî nûçeyekê ku di malpera Avestayê de hat weşandin, Rêxistina Îstixbaratê ya Turkiyê (MIT), derbarê Kerkûkê de raporek amade kiriye û ew rapor ku bi awayekî nepenî ji desthilatdarên wî welatî re hatibû nivîsandin, di kovara "TEMPO" ya Turkî de hate weşandin.

Rapora han ji Turkiyê daxwaz dike ku li hember pêşketinên li Başûrê Kurdistanê pêk tên, xwe amade bike û rê nede ku Kurd Kerkûkê bi dest xwe ve bînin û nift (petrol)a wê bikeve dest û kontrola Kurdan.

Rapora 3 rûpelî ya "MIT"ê diyar dike ku Parlemana Kurdistanê, Wezareta Pêşmerge ava kiriye û hejmara wan digihîje 180 hezar Pêşmerge. Rapor ji dewleta Turkiyê daxwazê dike ku li hember wan pêşketinan bêdeng nemîne û bi awayekî micid bi vê dozê re tevbigere. Rapor ji aliyê cihgirê "MIT"ê cemal Uzgoren ve hatiye nivîsandin.

Dewleta dijî Kurd ya Turkiyê jî wekî Îran û Sûriyê bi xurtî ji pêşketin û bidestxistinên Kurdan li Kurdistana azad û federal ya Îraqê nerehet û nigeran e û hemû hewl û xebata wan têkdan û alozkirina herêma azad ya Kurdistanê ye.

## Gemiyeke Torîstî Ya Endonizyayê Bi 600 Rêwiyan Ve Niqûm Bû

Termê 66 kes ji rêwiyên Gemiya torîstî ya Endonizyayî ku roja Înê ji Komay a Cawê ber bi Cawê ve birêketibû, hatin ditin. Ew gemiya ku hilgirê 600 rêwiyan bû li nêzîk Behra Cawê niqûm bû.

Hêjayî gotinê ye ku heya niha pêtir ji 100 rêwiyên vê gemiya Endonizyayî ji aliyê girûpên xilasker(Îmdad) ve hatine rizgar kirin.

## Swêd Weke Yekemîn Welatê Demokratîk Di Sala 2006'an De Derket



Rojnameya Ekonomîk ku li Birîtanyayê weşanê dike û girîngiyê dide warê siyaset û aboriya cîhanê, di şîrove û lêkolîna xwe ya herî nû de lîsteyek ji bo diyarîkirina mijara demokratîkbûna welatên cîhanê di sala 2006'an amade kiriye. Armanca rojnamê eva ye ku welatên herî demokratîk di cîhanê de bide xuyakirin.

Ji bo rojnameya Ekonomîkê xuya bûye ku tenê 167 welat di hemû cîhanê de hene ku mirov dikare ji wan re bibêje welatên demokratîk. Di Lîsteya rojnameya Ekonomîkê de, welatê **Swêdê** di pileya yekem di cîhanê de cih girtiye. **Îsland** duyem, **Holanada** sêyem, **Norwej** çarem, **Danîmarka** pêncem û **Fînlanda** weke welatê şeşem yê cîhanê hatiye nasîn.

Di vê nirxandina rojnameya Ekonomîk ya Ingilîstanê de, welatên Bakûrê Ewropayê û Îskandînavyayê pêşengên wan welatan tên dîtin ku pirensîpên demokratîk li jiyana siyasî, civakî, aborî, çandî û azadiya ramanê tê de birêve diçin.

Kureya Bakûr jî di lîsteya han de welatê herî dawî hatiye nasîn ku ne demokratîk e.

# Em Nigeranê Jiyana Mihyedîn Şêx Alî Ne



**Mihyedîn Şêx Alî**

Piştî ku roja 20.12.2006'an de, Mamosta Mihyedîn Şêx Alî, Sekreterê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ) ji aliyê dezgeha Ewlekariya Leşkerî ya Sûriyê ve hate girtin û ew birin cihekî nediyar û heta niha ji rewşa saxlemiya wî ne diyar e. Ev gava hovane ya rejîma Sûriyê jî bi armanca tirsandin û berlêgirtina xebatkarên azadîxwaz û demokrat yên Kurdistana Sûriyê ji bo nemeşandina xebat û tekoşîna siyasî û neteweyî ya Kurdan di wî welatî de derketiye holê. Ev kiryarên wiha mehkûm û şermezar in û nikarin xizmetê bi çareserkirina demokratîk ya doza Kurd li Sûriyê bikin.

Em hêvî dikin ku Mamosta Mihyedîn Şêx Alî bi zûyî û lezgînî azad û serbest were berdan.

www.arsivakurdi.org